

Koleyê Aqilmend

Hesenê Cumî

Rojekê Mîrekî ji bajêr koleyê herî nîrxbiha û aqilmend, kirî . daku aqilmendiya wî nasbike, jê pirsî : Koleyê min! Ev hespê min yê boz resene an na?.

Kole got: Mîrî min ê hêja tuyê sê rojan bidî min, daku karinim bersiva te bidim. Piştî sê rojan kole vegeerî û got : Mîrê min, ev hespê te bi çêlekan re jiya ye. Mîr xwediye hêsp anî û jê pirsî: Ka ya rast ji min re bêje. Hespfiroş got: Mîrê min, ya rast di çûkaniya wî de, dê dimer û ew bi şîrê çêlekan xwedî dibe.

Mîr ji kole pirsî: Te çawa zinî ev ne rsen e?.

Kole got: Mîrê min, gava hesp avê vedixe dike qorteqort û yek car avê vedixe, lê çêlek di ber lêv û diranên xwe re avê diweşîne.

Mîr got : ka nanekî zêde bidin kole.

Roja dî mîr ji kole pirsî: Ka vê carê ji min re bêje: Ev bazê min resen an na?. Kole dîsa got: Mîrê min ê hêja tuyê sê rojan bidî min daku karibim bersiva te bidim. Piştî sê rojan, kole vegeerî û got : Mîrê min, ev bazê te bi mirîşkan re xwedî bûye. Mîr ji xwediye baz pirsî .Mîrê min ya rast, ev baz li nav mirîşkan xwedî bûye. Mîr ji kole pirsî : Te çawa ev yeka zanî?. Kole got: Mîrê min ê delal, baz bi nikilê xwe goşt ji laşê nêçîriya xwe diqetîne, lê mirîşk , niklê xwe di erdê dide daku xwerina xwe qetqetî bike. Mîr got: Manekî din zêde bidin kole.

Mîr dîsa ji kole pirsî û got: Koleyê min, sê roj ji te re , daku tu ji min re bêjî, ez ji piştî bavê xwe me an na?.

Kole yekcar got : Mîrê min bersiva te amedeye, tu kurê nanfiroşî. Mîr agir dada û diya xwe bir ber êgir û got: Ka ji min re bêje kî bavê min e?. Dê got: Kurê min rûyê min ji reş e, zarok ji bavê te nedibûn, ji bo paristina payêtexa bavê te , ez şevkê bi

nanviroş re raketim.

Mîr ji kole pirsî: Çawa te ev jî zanî?. Kole got :Ev ji ber camêriya te ye.

Bûyerek rast

Keça Mamoste

Cotyarê Cûmê

Dibêjin mirov di welatê xwe de dibe biyanî . Ma ev gotin ta kîjan radeyê di cî de ye?! . Ji deşta cûmê , herêma Efrînê , Rojîna biçûk tevî malbata xwe bardikin bajarê Helebê . Ew li wir mezin dibe . Lê , hertim kuç , kastîn û wênayên pir tiştên gund û zarokatiya wê di bîra wê de dimînin û di berçavan re derin û tîn û girêdana wê bi gund ve bi hêztir dikin . Piştî demekê xwendina xwe , beşê mamostetiye bi dawî tîne , bi hêviya ku li herêma Efrînê bibe mamoste û nifşên nû fêr bike . Dema ku belgeya bicîkirina xwe werdigre , ji kêfa re difire û bi lez vedike û dixwîne . Ew têdighe , ku li dibistana gundê (El Muzeyenê) , li herêma Efrînê bi cî bûye . Gelek şadibe , lê , li ber navê gund disekine û dibêje : Gelo gundê Muzeyenê li kû dikeve!? . Paşê dîsa ji xwe re dibêje: Xwedî û merivên min, wê ji min re bibêjin . Lê , mixabin tu kes ji heval û nasên wê jî nizanin li kû ye . Di dû re , xwe hildigre û dere gundê xwe û li ba mala mirovekî wê , merivên wê lê dicivin , dîsa jî tu kes nizanê . Lê dibêjin: Ger hebe ev ne navê gund ê resen e û xuya ye ku navekî hatiye te'irîbkirin e . Piştî gelek lêpîrsînan , derdikeve , ku gundek ji gundên bajaroka " Şiyê " ye .

Di şevbuhêrkek ji şevbuhêrkên xwedî û merivên Rojînê de , ku axaftina wan li ser guhertina navên gund û bajarên Kurdistan bû , li wir Rojîn têgihîşt û ji civatê re got : A weha mirov di welatê xwe de , xwe biyanî dibîne û dijî